Kanton St.Gallen
Departement des Innern

**Amt für Soziales**
Kompetenzzentrum Integration und Gleichstellung

**Agahahiyên qursên ku dê 1.4.2019 destpê bike**

**Elmanî hîn bibin – ew hêjayê hînbûnê ye.**


Ji bo  Kesên ku li  Kantona Gallenê rûdinin beşdarê qursa xwendin-nivîsandin û Elmanî ya heta asta B2'ê bibin, Kanton û Hikumeta federal destekê dide wan.

Mafê we heye ku ji bo her **kursa zimanê Elmanî rêjeya CHF 7 an jî 8 CHF ji bo kursa hîbûnê daşikandinê bistînin**, eger xwedî mercên jêrîn bibin:

- Kesên ku rûniştvanê Kantona St. Gallen ne.
- Divê dahata bibace (perê hûn kar dikin)  ji 40,000 CHF'an kêmtir be ji bo jin û mêr, an jî malbatan divê dahat ji 55,000 CHF'an kêmtir be.
- Kesên ku bêbace dixebitin an jî hisaba perê wan nehatibe bibace kirin (di resmiyetê de xuya neke),  ji sedî 75'an dahata wan ya seranserê salê, dê wek bace bê hisap kirin.
- Dahata wan ya bibace divê ji 50,000 CHF'an kêmtir be.
- Divê destûra xebatê ya biyanî ji bo dereca B,C,L hebe an jî ew hemwelatiyê Swîsre'yê bin.
- Divê heqê qursa wan ji aliyê saziyek dî(mesela; ofîsên refaha civakî, AHV-IV meaşê teqawîtbûnê, RAV, SUVA, an jî Kardêr) neyê dan.
- Kesên xwe di qursan de qeyd bike, divê bikeve herî kêm ji sedî 80'ê dersan. (bêdewamî divê nekeve binî ji sedî 80'an)
- Piştî qurs xelas bibin, perê hatî dan cardî nikare bê stendin.

Heke hûn van şertan pêkbînin û serîlêdana we bê qebûl kirin, divê dibistana zimanê ji we re fatûraya rêjeya bi erzanî bişîne. Di Dibistanên Elman yên Kantonê ku hatine akrîdîte kirin de, ew erzanî dikare bê bikaranîn.

Ji bo hûn bi erzanî xwe qeyd bikin, ji lîsteyê Dibistanekê akredītekirī bijêrin û bi dibistana zimanî re serî lê bidin. Dibistan dê bi destûra we, serîlêdanê ragihîne Ofîsa Karên Civakî. Ji bo zêdetir agahiyan, li malpera Kantonê binêrin: www.deutschkurse.sg.ch.



Kanton St.Gallen
Departement des Innern

**Amt für Soziales**
Kompetenzzentrum Integration und Gleichstellung

## Pêvajoya bidestxistina rêjeyên erzanî

1. Beşdarên qurs (CPT) li dibistanê qeyd bikin.
2. CPT, ji Ofîsa Karên Civakî û dibistana zimanî re pêkanîna şertan dipejirîne.
3. Serîlêdan ji distana zimanî re tê şandin û bi rêya e-maîlê ji OSA(Ofîsa Karên Civakî) re tê ragihandin. Serîlêdan, dikarin herdem bêne şandin. Lê dîsa jî, berî ku ders biqedin ev yek divê bêne durust kirin. Bi tenê serîlêdanên bi forma resmî ya ji OSA re hatî kirin têne qebûl kirin.
4. Serîlêdan ji aliyê OSA'yê (piştî tê wergirtin) di nav sê hefteyan de tê kontrol kirin. Dibistanên zimanî di nav wan sê hefteyan de, xwe ji dana fatûran vedikêşin. Piştî bi awayekî serkeftî qedandina qurs, ti rêjeyên bi erzanî yên hatî dan  nikarin bêne xwestin.
5. OSA dikare  agahiyên radestkirî yê CPT'ê kontrol bike û belgeyên pêwîst ji serîlêderan daxwaz bike.